Fachhochschule Nordwestschweiz
Pädagogische Hochschule

ESKE

Ermittlung schulsprachlicher Kompetenzen in der Erstsprache

KURDISCH KURMANCI

Aufgabenset 5 bis 6 Jahre Schulerfahrung

© Pädagogische Hochschule FHNW 2018

Professur Deutschdidaktik und Mehrsprachigkeit im Kindesalter

Mathilde Gyger & Ursula Ritzau

Erk

1. Ji kerema xwe re vê nivîsê bi deng bixwîne.



Dûpişk – endamek ji malbata pîrê
Qet ne hizreke baş e ku li welatên germ mirov tiliya xwe bixe quleke di dîwêr de ango navbera keviran. Gava pêlava mirov li cihekî demdirêjî ma, berya mirov bixe lingê xwe, divê berûvajî bike û daweşîne. Dibe ku tiştekî xwe tê de veşartibe. Dûpişk ji ronahiyê hez nakin, di seranseriya rojê de xwe di qulê de ango di cihên tarî de vedişêrin. Dûpişk li welatên germ li her aliyê cîhanê hene, lê belê mirov wan kêm dibîne.

Bi pêvedanê neçîra xwe dikuje
Dûpişk dikarin pir bi jehr bin, tevî ku gelek cureyên wan ji bo mirovan ne kujêr in jî. Li gorî cureyên wê, ji santîmekê heta bîstûyek santîman dirêj dibin. Hemû cureyên wan xwediyê kîsikekî jehrê ya li serikê dûvikê xwe ne. Dûpişk bi antenên xwe nêçîra xwe hîs dike, bi lepûşkên xwe pê digre û dûvikê xwe bi jorê ve di ser pişta xwe re ditewîne û li nêçîra xwe dide, pê vedide. Dûpişkên xetare xwe zû û bi lez dizîvirînin ku derziya xwe li hember dijminê xwe bi kar bînin.

Dûpişk bi şev pîrê û kêzikên din digrin. Ew bi antenên xwe hîs dikin, nêçîra xwe bi lepûşkên xwe digrin û bi derziya xwe ya tije jehr pê vedidin, dikujin.

© 2018 Pädagogische Hochschule Fachhochschule Nordwestschweiz
IKU Prof. Deutschdidaktik und Mehrsprachigkeit im Kindesalter

2. Nivîsa di erka 1ê de û pirsên li jêrê bixwîne . Nîşan bike bê rast an çewt in.

1. Dûpişk ji tarîtiyê hez dikin. rast ☐ çewt ☐

2. Hemû dûpişk dikarin mirovan bikujin. rast ☐ çewt ☐

3. Hemû dûpişk bi qasî hev mezin in. rast ☐ çewt ☐

4. Dûpişk bi lepûşkên xwe neçîra xwe digirin. rast ☐ çewt ☐

© 2018 Pädagogische Hochschule Fachhochschule Nordwestschweiz
IKU Prof. Deutschdidaktik und Mehrsprachigkeit im Kindesalter

3. Ka bêje nivîsa erka 1ê di derbarê çi de ye.

© 2018 Pädagogische Hochschule Fachhochschule Nordwestschweiz
IKU Prof. Deutschdidaktik und Mehrsprachigkeit im Kindesalter

4. Di nivîsa erka yekê de dibêje ku divê mirov pêlava xwe daweşîne. Çima divê mirov vê yekê bike? Bêje bê tu çima bi vê hizrê re yî.

© 2018 Pädagogische Hochschule Fachhochschule Nordwestschweiz
IKU Prof. Deutschdidaktik und Mehrsprachigkeit im Kindesalter

5. Dilê kalo dixwaze her roj biçe parkê û li wir li perperîkan temaşe bike, tevnek ku karibe wan pê bigre bi xwe re dibe. Ji bo ku tav nede serê wî şefqeyekê dide serê xwe. Îro wî perperîkeke pir xweşik a sor dît, lê nikarîbû ew bigirta. Di navbera perperîka sor û kalo de xêzkekê bikişîne.

© 2018 Pädagogische Hochschule Fachhochschule Nordwestschweiz
IKU Prof. Deutschdidaktik und Mehrsprachigkeit im Kindesalter

6. Kîjan ji van pêşbirkên li jêrê, ji ber şiliyê nikarin bi cih werin? Nivîsa li gorî wê bixe hundirê xelekê.

a) Bazdana kartonên şîr dikare awayekî tenduristî yê jiyanê li pêş bixe. Tevlêkarên pêşbirkê, erebeyên ji kartonên vala pêk tên in ku dikarin bi dest werin ajotin û di ser avê re bigihêjin armanca xwe.

b) Bazdana henîfe (muslix)a serşokê ev 50 sal in tê çêkirin. Bazdan 58 kilometreyan diajo û gelek xetên ewlekariyê hene. Hemû erebe divê mezin bin û di şiklê muslixên kevin ên serşokê de bin. Motor nikare bi hêz be.

c) Bazdana di çemê ziwa de, li çemekî çikiyayî tê çêkirin. Carekê hat betalkirin ji ber ku car din di çem de av hebû. Kelekên baz din bê binik in û divê ji aliyê beşdaran ve werin hilgirtin.

d) Qutiyê vexwarinê-keştiya geşt û seyranê salê carekê tê lidarxistin. Erebe ji qutiyên vexwarinê yên vala pêk tên û motor tê de hatine bicihkirin. Gelek ji wan hema bi destpêkê re xerab dibin û pêşbirkê hîn kêyfxweştir dikin.

© 2018 Pädagogische Hochschule Fachhochschule Nordwestschweiz
IKU Prof. Deutschdidaktik und Mehrsprachigkeit im Kindesalter

7. Li nexşeya jêrîn binêre û pirsên di derbarê de bibersivîne.



a) Kîjan cih nêzî benderê ye?
☐ bajar
☐ gol
☐ cotgeh

b) Kîjan cih li aliyê herî bakur e?
☐ balefirgeh
☐ daristan
☐ cotgeh

c) Gava tu ji bajêr ber bi golê ve biçî, tê di ser kîjan aliyî re biçî?
☐ di ser bakur re
☐ di ser rojava re
☐ di ser rojhilat re

d) Ji xwe re bihizire, tu diçî giravê ku bigerî, rênîşaneyan bişopîne:
- Ji nava gund dest pê bike,
- Rêka ber bi benderê ve diçe bişopîne,
- Di xaçerêka duwem de bizîvire aliyê çepê,
- Heta dawiya kolanê biçe.
- Niha tu li ku derê yî?

☐ li cotgehê
☐ li bajêr
☐ li benderê

© 2018 Pädagogische Hochschule Fachhochschule Nordwestschweiz
IKU Prof. Deutschdidaktik und Mehrsprachigkeit im Kindesalter

8. Nivîsê bi dengê bilind bixwîne.

Goga ji tûmik

Te qet goga ji tûmik (tûmê giyayî) bihîstiye? Di rastiyê de ew çepûrasteke (+) di navbera goga lingan û golfê de ye. Armanca lîstikê ev e ku bi goga lingan li alên biçûk ên berê li ser erdekî berfireh hatine çikandin bi pêtên (şûtên) hindik lê bidin. Herî kêm bi du kesan tê lîstin, yek ji wan alan diçikîne û yên din hewl didin bi gogê lê bidin.

Pêtên diavêjinê heta ku li alê dikeve tên hijmartin. Ew nikare ji zêdeyî neh pêtan be.

Lîstika yekemîn, gava her lîstikvanek alan bi cih dike diqede. Lîstikvan bi xwe biryarê didin bê dikarin çend caran bilîzin.

© 2018 Pädagogische Hochschule Fachhochschule Nordwestschweiz
IKU Prof. Deutschdidaktik und Mehrsprachigkeit im Kindesalter

9. Nivîsa di erka 8 de bixwîne û bersivên rast nîşan bike

a) Nivîs di derbarê çi de ye?
☐ Nivîs vedibêje bê çi cudahî di navbera goga lingan û golfê de heye.
☐ Nivîs vedibêje bê rêzikên lîstika goga tûmik çi ne.
☐ Nivîs aleke taybetî vedibêje (tarîf dike).
☐ Nivîs vedibêje bê ji bo çi ji mirov re al pêwîst in.

b) Divê mirov goga tûmik li çi tiştî bixe?
☐ Li lîstikvanê ku alê digre bixe.
☐ Li ala ku lîstikvan digre bixe.
☐ Li ala ku di erdê de hatiye çikandin bixe.
☐ Di navbera du alên li erdê hatine çikandin re derbas bike.

c) Çi tên hijmartin?
☐ Gogên li armancê dikevin tên hijmartin.
☐ Gogên vala derbas dibin tên hijmartin.
☐ Lîstikvan bi xwe biryarê didin.
☐ Pêtên (şûtên) pêwîst heta li armancê dikevin in.

d) Li cem kîjan her du cureyên werzîşê (sporê) goga tûmik tê lîstin.
☐ Golf û tenîs
☐ Goga lingan û tenîs
☐ Goga destan û goga lingan
☐ Golf û goga destan

e) Pêngavek kengî bi dawî dibe? Gava hemû lîstikvan carekê ....
☐ alan bi cih bikin.
☐ li armancê bidin.
☐ gogê biavêjin.
☐ li lîstikvanên din bidin.

f) „Çepûrastek (+) di navbera goga lingan û golfê de“ tê çi wateyê?
☐ Lîstik wê li ser xaçerêyeke kolanê were lîstin.
☐ Mirov di heman demê de bi goga lingan û golfê dilîze.
☐ Lîstik hinekî dişibe goga lingan û hinekî dişibe golfê.
☐ Komek jê bi goga lingan dilîze û komek jê bi golfê dilîze.

© 2018 Pädagogische Hochschule Fachhochschule Nordwestschweiz
IKU Prof. Deutschdidaktik und Mehrsprachigkeit im Kindesalter

10. Li ser hevalekî/e xwe yê/a baş bihizire. Li vê derê binivîsîne bê hevaltiya we çawa çêbûye û çima kêyfa te ji hevalê/a te re tê û hevaltî ji bo te tê çi wateyê.

© 2018 Pädagogische Hochschule Fachhochschule Nordwestschweiz
IKU Prof. Deutschdidaktik und Mehrsprachigkeit im Kindesalter